



Armanca rapora Human Rights Watchê perçekirina netewî ye, Mijdar 2009

## Gava nû ya Human Rights Watch ê: Rapor e an perçekirina Kurda ye?!

**Amadekar: Gabar ÇIYAN**

Rapora dezgeha mafê mirovan Human Rights Watch-HRW ê ku navenda xwe li New York ê ye, di 10 vê mehê derket û belav bû. HRW, "rewşa mînorîtetan li navçeyên bi problem" li Iraq û Kurdistanê dike cihê niqaşê: <http://www.hrw.org/en/reports/2009/11/10/vulnerable-ground-0>. Danasîna raporê ji aliyê Rêvebirê HRW - Rojhilata Navîn, nivîskar Joe Stork ve hatiye kirin. Rapor ji 51 rûpelan pêk tê û ji çend aliyan ve balkêş e. Ez ê tenê li ser 3 aliyên raporê, ku yekser anjî sergirtî tê pêşkêşkirin, dîtina xwe bihênime zimên:

- 1- Şefê HRW ê Joe Stork ku bandora wî li raporê bûye û HRW, Êzidiyan weke "komek etnîkî" û "minorîtetekî" pêşkêş dike. HRW, ji Hikumeta Herêma Kurdistanê-KRG û hikumeta Iraqê dixwaze ku Êzidiyan weke "minorîtetekî" bipejirînin...
- 2- HRW, Pêşketina li Herêma Kurdistanê, bihêzbûna Kurdan û parastina kurdên "li navçeyên bi problem" ji aliyê Hêzên Herêma Kurdistanê sedem dibîne ku nasyonalîzma ereban bilind dibe û ektiremîstên ereban êrîşê dibine ser devera Musil û derûdora wê...
- 3- HRW, Bi hêzbûna Kurdan û bidestxistina dewlemendiya neftê sedem dibîne ku, li cem Turkiyê, Îran û Sûriyê taswas û endîşê pêk were...

### **Nirxandinek giştî**

HRW her wisa di rapora xwe de, li ser pêlkirina mafê mirovan jî radiweste û Hêzên Ewlekariya Herêmê li ser pirsê rexne dike. Li ser girtinên kêfî û îşkencekirinê zaniyariyê dide. Hêzên siyasî, ji bo ku çandên li herêmê weke mîsal, Asuriyan nêzî xwe bikin, bi rûşwet dayîn, û di dema hilbijartinê de mudaxelekirina qonaxa hilbijartinê suçdar dike. Hêzên li Herêmê destê xwe dirêjî nav hilbijartina berendamên mînorîtetan dikin û azadiya wan bi sînor dikin.

Ev rexne ne nû ne. Em bi xwe jî, hem weke hemwelatîyek Kurd, hem jî weke dezgehek mafê mirovan, KRG ê li ser pirsgerêka mafê mirovan rexne dikin. Carna pîvana rexneyên me giran dibin û rê lê vedike ku em şaş bêne fêmkirin.

Pêwîst e KRG ji rexneyên erênî re vekirî be. Hewil bidin şaşîtiyên hene rast bikin û rê ji bo pêşketina demokrasiyê vekin.

### **1- Êzîdî**

Dîtina me, EuroKurd Human Rights-EHR ê li ser pirsê wisa ye:

Êzîdî ispat û delîla zindî ya hebûna Gelê Kurd e. Çand û ola me ya kevnare bi saya serê wan dijî û xwe gehandine roja îro. Li hemberî îdeolojî û dagîrkêriya biyanî serî netewandine û

wan, nixên me yên pîroz parastine. Ev aliyek rastiyê ye. Ev rastî, gelek caran ji aliyê Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî ve jî hatiye gotin...

Li aliyê din, Êzîdîyan zilm û tadeyî gelek dîtine û kişandine. Bi taybetî ji destê birayên xwe yê Kurdên Mihemedî. Beşek pir hindik ji oldarên me, Qûrana pîroz di çarçoveyekî teng de şirove dikin û kûştina wan îro jî bi dengê bilind dipejirînin.

Cihê Êzîdîyan li "navçeya bi problem" e. Lê heman dever, di nava xaka netewî de ye. Lalişa Nûranî, "bi qasî Vatîkan û Mekeyê" li cem me Kurda pîroz e. Nedîtina vê rastiyê û hewildanên veqetandina xaka pîroz ji Kurda û Kurdistanê, skandal e, helwêstek ne însanî ye û armanca xwe careke din perçekirina me Kurda û xaka netewî ye.

Pêwîst e cihê Êzîdîyan ji aliyê KRG ve bê kontrolkirin û ev dever li hemberî êrîşên Ereb û Kurdên Mihemedî bê parastin. Îdareya cihê wan, weke şaredarî û walîti bi destê wan bibe. Hejmara niwênerên wan di Parlemantoya Kurdistanê de bê zêdekirin. Divê pirsê parastina Êzîdîyan û mafên wan di qanûna bingehîn ya Kurdistanê de cî bigire.

Pêwîst e KRG pirsê cidî bigire û xwestina Serok Barzanî ji bo Êzîdîyan di pratîkê de pêk bihêne. Dema mafê wan neyê parastin, Êzîdî dê roj bi roj hêviya xwe ji birayê xwe yên Mihemedî, KRG û ji hêzên Kurda qût bikin. Ev bêhêvbûn dê rê ji lêgerînan nû re veke.

### **Nirxandina HRW ê li ser Êzîdîyan**

Human Rights Watch-HRW, li ser pirsê reh û dîroka Êzîdîyan, Kurdayetî û cihê wan ji pîvanên ilmî dûr dikeve û ji kurda dixwaze ku Êzîdîyan weke grupek etnîkî li derveyê Kurda bipejirîne. Bi vê yekê, ji kurda dixwaze ku înkara xwe, înkara hebûna xwe bikin.

HRW ji awira dîrokî, çandî, ziman û toreyan ve yekbûna me nabîne. Ji awirên ilmî ve pêwîst nabîne ku nirxandinê bike. Tenê dixwaze ku Kurd daxwaziyên wan bipejirînin. HRW bi rêya dezgeh û rapora xwe, ne tenê ji Kurda, her wisa zextê datîne ser dezgehên siyasî û însanî yên navnetewî ku armanca xwe bi cî bîne, xak û netewa Kurda ya parçebûyî careke din dabeş bike. Wezîfeya HRW ne ew e ku, cendekek, neteweyekî parçebûyî, careke din dabeş bike!..

Hayê me ji lîstika li ser Êzîdîyan û veqetandina wan ji netewa Kurd û cihê wan ji xaka pîroz, heye. Divê Gelê Kurd, KRG û hêzên netewî ji bo mafê Êzîdîyan gavên cidî bavêjin. Lê pir giring e hemû kes baş fêhm bike ku, xwestina mafê azadiya olî û polîtîk ji bo Êzîdîyan tiştek e û parçekirina Netewa Kurd û Kurdistanê tiştekî din e. Cûdadîtina Êzdayetiya Esîl ji rûhê Kurdayetiyê çî caran nikare bê qebûlkirin. Em ê çî caran xwestina parçebûna netewî qebûl nekin!

### **2- HRW: "Pêşketina li Herêma Kurdistanê nasyonîzma ereban bilind dike..."**

Em, EuroKurd Human Rights nikarin dîtina HRW ê bipejirînin. Bi baweriya me:

Li Kurdistanê gelek navçe hene ku pir rengîn in û pirçandî ne. Divê çandên wir bêne parastin û rêz ji mafê wan re bê girtin. Dema bixwazin dikarin di Parlemantoya Kurdistanê de niwênerên xwe hebin. Giring e KRG di pirsên wisa de pir firehtir hizir bike. Mafê çandên li Herêma Kurdistanê nas bike.

Li deverên wek Kerkûk û Mûsilê pirsê hesas e. Cihên wisa pirçandî û dewlemend pêwîstiya xwe bi çareserkerînek kolektîv heye. Pirs ji aliyê wext ve dikare dirêj bibe. Divê çareserî bi

rêya hev fêmkirin, bi sebir, bi şêwir û peymanan bên peydekirin. Pir giring e ku KRG, di qonaxa çareserkirina pirsê "navçeyên bi problem" de, li navçeyan mafê xwe û parastina hemwelatîyên xwe hebe, di rêvebirîyê de xwedî gotin be û paya xwe li gorî hejmar û mafên xwe yê dîrokî garantî bike.

Bersiva me ji HRW ê re wisa ye: Divê xwedîderketina KRG ê di "navçeyên bi problem" de li xak û hemwelatîyên xwe, û pêşketina Kurda li Herêma, çî kesan nerehet neke. Kurd li ser welatê xwe bi hêz dibin. KRG ne li Erebistanê, lê li Kurdistanê xizmetê dike û Kurdistan pêş dikeve. Ev jî pêşketinek xwezayî ye, normal e.

Sedema hişkiya nasyonalîzma ereban ne ji ber hêzbûna Kurdan li Herêma ye. Pirsgirêka ereban ya herî mezin, nefêmkirina mafê gelan li ser xaka wan e. Şirovekirina wan li ser demokrasî û mafên demokratîk e. Li welatên ereban pirsgirêka pêşketina demokrasîyê û parastina mafê mirovan mezin e.

HRW, tenê çend bendên şiklî ji biryarên Yekîtiya Erebîyan dibîne, lê rastiya nasyonalîstên ereban û paşverûtiya wan baş nabîne û hetanî cihê bi mentalîta ereban li pirsê dinêre û dinirxîne.

Dil dixwaze ku demokrasî, mina li Herêma Kurdistanê pêş dikeve, li nav ereban jî pêş bikeve. Lê dema pêş nekeve û nasyonalîstên ereban bi tehdîdan xelkê ji cihê wan rakin, bi tehdîdan xwestinê xwe bi cî binin û êrîş bibin ser welat û cihê xelkê, helbet dê xelk jî xwe biparêzin. Di dema êrîşên terorî de, mafê parastina hemwelatîyan mafekî pîroz û giring e.

Dîtina EuroKurd Human Rights- EHR ê li ser êrîşên terorî yê nasyonalîstên ereban wisa ye: Her netewe mafê xwe û parastina xak û hemwelatîyên xwe, heye. Divê Hêzên Ewlekariya Herêma Kurdistanê û KRG ji bo bêtesîrkirina êrîşên ekstremîstên ereban amade bin û profesyonel bixebitin. Dezgehên modern ava bikin. Ji bo lêkolîn, arşîvkirin, raçavî û parastinê bi şêweyên modern bixebitin û ne li benda êrîşan bin, lê berî êrîşan, navendên terorî tespît bikin û terorîstan di çarçoveya qanûnî de bêtesîr bikin.

### **3- HRW: "Endîşeya Turkiyê, Îran û Sûriyê ji ber bihêzbûna Kurdan e..."**

Divê hinek ji HRW re bêje: Hinekî bi wijdan bin û rastiye bibînin!

Turkiyê û Îranê bi şêweyekî sistematîk gelek deverên Herêma Kurdistanê ji erd û ezmên ve bombebaran dikin. Xweza û erda Kurdistanê ji ber bombarankirina wan jehrî bûne. Li Binya Xetê, rejîma Baas ya dîktatorê Esad, hebûna Kurdan înkâr dike. Li wir girtin, îşkence û kûştina kurdan bûye karê rojane. Li hemberî vê rastiye, li gorî HRW ê, Turkiyê, Îran û Sûriyê ji ber pêşketina kurdan li Herêma bi endîşe ne (!?).

Bi qasî ku em zanin, dibînin û dixwînin, Hikumeta Herêma Kurdistanê-KRG, bi taybetî Serok Barzanî û Talebanî ji bo avakirin û xurtkirina pirên dostaniyê di nava welatên cînar de, pir dixebitin. Gera rêvebirîna Turkiyê li Herêma Kurdistanê, serdana rêvebirîna Herêma li welatên cînar, beyan û lihevhatinên dostanî, nîşanên pêşketina dostaniyê û hevfehmkirinê li herêma ye.

Bihêzbûna Kurdan ya aborî rê ji bo dewlemendiya herêmî û global vedike. Îro li Herêma Kurdistanê bi dehan şirket, bi hezaran xebatkarên welatên cînar û yê navnetewî hene. Dema rewşa aşîti û azadî, rêyên hevfehmkirinê hebe, peydekirina endîşeyên xeyalî ji holê radibe.

Divê HRW ne li ser xeyal, lê li ser bingeha rastiya heye û xuyanî dike raporên amade bike.

### **Şefê Human Rights Watch ê Joe Stork kî ye**

Stork mirovek çep e û weke kesek radîkal tê nasîn. Bê guman e ku hizirên wî yê baş ji bo Kurda hene û ev yek di raporê de, kêmjîbin xuyanî dikan.

Li gorî zaniyariyên hatine belavkirin, Stork di salên 70 î de piştgirî daye Filistîniyan. Lê weke hinek kesên çep ketiye şaşîtiyê. Ji bo destxistina mafê Filistîniyan aqilmendiya rejîmên ereban yê paşverû kiriye û ji bo vê hatiye rexnekirin. Rast anjî xelet, li dijî biryarên Emerîkayê derketiye.

Ji gelek nivîs û belgeyên hatine belavkirin eşkere xuyanî dike ku Stork, ji bo piştgiriya Filistîniyan nêzî dîktatorê xwînrej, qatîlê bi hezaran mirovan Saddam Hisêynî bûye. Stork weke dostê Sadamî hatiye binavkirin û naskirin. 1976 an de Saddam Hisêyn konferansêkî li dijî rasîsmê li dar dixê. Stork mêvanê Sadamî bûye û di konferansê de beşdar bûye. Ji bilî vê, li ser dostaniya Stork ya bi rejîmên ereban re îdîa belav bûne.

Stork bi belavkirina zaniyariyên şaş jî hatiye rexnekirin. Li gorî îdiayan, beyana Menachem Begin bi şeweyekî din hatiye şirove kirin û belav kirin. Ev yek bibû sedema krîzekê. Her wisa qala nameya ji Serok Bush re hatibû şandin jî tê kirin ku name bi şaşîtiyan hatibû barkirin.

Diyar e ku, têkiliyên dostaniyê yê dirêjayî dikare bandorê li mirovî bike. Bandora derve dibe sedem ku, mirov ji awira wan li probleman binêre û binirxîne. Ji pîvanên ilmî dûr bikeve û li ser zaniyariyên bê bingeş, perçeyek ji neteweyekî weke mînorîtet nîşan bide. Bihêzbûna neteweyekî weke tehdît nîşan bide, ûhwd.

### **Tawsiyên EuroKurd Human Rights ê ji bo HRW ê**

Belê, weke tê dîtin HRW şaşîtiyên cidî kirine. Divê li ser şaşîtiyên xwe hizir bikin û rê li ber şaşîtiyên nû bigirin. Her wisa rol, cî û sînoren xwe zanîbin û li gorî wê daxwaziyan xwe bihênin zimên.

- Pêwîstiya Kurdan bi piştgiriya HRW ê heye. Divê HRW bi dostani nêzî kurdan bibe.
- Divê HRW, ji bo maf û xurkirina dostaniya nav gel û çandên li herêmê bixebite, endîşeyên xeyalî zindî neke, Kurda ji erebên nasyonalîst re neke hedef, hewil bide ku toleransa heye zêdetir bibe.

### **Banga EuroKurd Human Rights ê jibo Gelê Kurd**

Qonaxa pirperçekirina /dabeşkirina Kurdan û Kurdistanê îro jî di bin nave cewaz, bi plan û programên piralî, ji aliyê şexis, dezgehên fermî û ne fermî de didome. Ev demek e Êzîdiyên li Kurdistanê û yê li Komarên Rûsyaya berê, bûne hedefa hinek kes û dezgehên. Ew dixwazin, me ji rehên me yê esîl, ji Êzîdiyan qût bikin. Dixwazin bi teoriyên bê bingeş, zaniyariyên şaş û bi piştgiriya hinek kesên menfeetperest bigihêjin armanca xwe. Pirs cidî ye. Divê dengê me li dijî wan û fikrên wan yê şaş bi şeweyekî demokratîk bilind bibe.

Human Rights Watch-HRW, bi zanabûn anjî nezanî, eşkere anjî sergirtî xeletiyek wisa kiriye. Pêwîst e Gelê Kurd nerazîbûna xwe li dijî şaşîtiya HRW ê, bi rêya nameyan, bi kurdî û zimanên cewaz bihêne zimên. Bêdengmayîn, pejirandina raporê ye...

E-mailên HRW ê wisa ne: [hrwnyc@hrw.org](mailto:hrwnyc@hrw.org), [hrwpress@hrw.org](mailto:hrwpress@hrw.org), [hrwbe@hrw.org](mailto:hrwbe@hrw.org), [hrwuk@hrw.org](mailto:hrwuk@hrw.org), [paris@hrw.org](mailto:paris@hrw.org), [hrwdc@hrw.org](mailto:hrwdc@hrw.org), [berlin@hrw.org](mailto:berlin@hrw.org), [hrwqva@hrw.org](mailto:hrwqva@hrw.org).

**Tebîni:** Gabar Çiyan rêvebirê EuroKurd Human Rights ê ye û di rêvebiriya CHAK-Bakûr de cî digire.